CORÊN ZIMANAN, LI DÛ HEVBENDIYA MORFÎMAN DI ÇARÇOVEYÊ PEYVÊ DE

E.Wehab Xalid

Zimanvanê sedê hejdê Wîlyem Von Hambold zimanên cîhanê, bi ser sê coran, li dû hevbendiya di navbera morfîman de, di çarçoveyê peyvê de, dabeş kirîne:

Yek: Ew zimanên peyvên wan, ji rêzeken morfîma pêk dihên û morfîm bi sanahî dihêne destnîşankirin û jêk cudakirin, ev ziman e bi navê Agglutinative wate (nîsek) dihêne navkirin, ku morfîmên wan bi rêz pêk ve dihêne girêdan wek zimanê kurdî, turkî, japonî, sewahîlî. .. htd.

Du: Ew zimanên ku morfîmên wan di navêk de dihêne helyan û bi sanahî nahêne destnîşankirin û cudakirin ku bi navê (fusional) wate – halyay yan tuwaw e navkirîne - .Bo nimûne zimanê erebî, latînî, girîkî .. htd.

Sê: Ew zimanên ku her peyveke wan ji morfîmekê bi tinê pêkhatî bi navê (Isolating) wate (dûreperêz) navkirîne. Di van core zimanan de, her yekeyeke watayê û her yekeyeke rêzmanî bi morfîmeke serbixwe dihête derbirîn; wek zimanê çînî.

Li dûmahiyê ew rastî diyar bû ku hîç zimanek di cîhanê de nîne bi temamî ji corekî bi tinê be, ji ev ên serî, di hemû zimanan de, her sê qalib bo darêtina peyvan dihêne destnîşankirin, lê corek bi ser herduyên dîtir de zal dibe û bi wî navî dihête navkirin. Bo nimûne zimanê kurdî, zimanekê nîseke, çunkî morfîmên peyvên wî bi sanahî dihêne destnîşankirin û jêkcudakirin.

Kurên wî kur - ên - wî , kirmanciya jorî.
kurekantan kur - eke - an - tan, kirmanciya jêrî.

Nimûneyên corên dîtir jî, bi rêjeyeke kêm tir diyar dibin , bo nimûne, di zimanê kurdî de, regê karê rabirdû eger bi (~) dûmahî hatbe :

Demê rabirdû	Reg	Demê bihêt
nivîs-î	nivîs	bi - nivîs - e
diz-î	diz	bi - diz - e
nas-î	nas	bi - nas - e
pirs-î	pirs	bi - pirs - e

Nimûne bo corê (dûreperêz – isolating) jî ew peyvên yêk morfîm in ku hîç pêşgir û paşgiran wernagirin û naçine ser çu peyvên dîtir wek (çunkî, belê, heta, kengî... htd).

Hejmara ev her du corên dûmahiyê beranber corê yekê, geleka kêm e, ji ber vê çendê zimanê kurdî bi zimanekê (nîsek – agglutinati) ve di hête niyasîn.